# KULÎLKÊN EZÊB

Kamiran Alî Bedirxan



# NAVEROK


Çend Pend / Emîn Alî Bedirxan / 7
Xatirxwaziya Memî / 9
Xanî / 10
Lalelav / 12
Ma Çıman Diçî / 13
Yekbûn û Yekîtiya Kurdî / 14
Şîn û Pesna Zînê / 16
Welatê Kurdan / 18
Birîn / 20
Ştrana Dilan / 22
Ala Kurdan / 25
Dilkoçerê / 26
Kurdistan / 28
Hişyarî / 30
Zmanê Min / 32
Meşheda Ibretê / 33
Heyv û Stêr / 36
Pehîz / 37
Gulê / 39
Welat û Dilê Min / 40
Henek / 42
Kulîlkên Ezêb / 44
Hotvîn / 45
Strana Çiyayekî / 47
Li Ber Tirba Şêx Seîd / 48
Ştrana Gulê / 50
Kûvan / 51
Roja Nû / 53
Revandin / 54
Koçera Mîran / 56
Bi Yek Bin / 58

KAMIRAN ALÎ BEDIRXAN

•

# Kulîlkên Ezêb

WEŞANÊN AVESTA: 45
Şîrên Lal: 10
*Kulîlkên Ezêb/Kamiran Alî Bedirxan*

Edîtor: Abdullah Keskin
Dîzayna Bergê: Avesta
Wêneyê Bergê: Pablo Picasso
Tîprêzî û Mîzanpaj: Avesta
Çap: Gülen Ofset
Çapa Yekem: 1998, Stenbol

AVESTA BASIN YAYIN
REKLAM TANITIM MÜZİK
DAĞITIM LTD. ŞTİ.
Asmalı Mescit Sokak
Şahin Han:35 / 403
Beyoğlu/İstanbul
Tel–Faks: (0212) 251 71 39

ISBN: 975–7112–29–1

Kamiran Alî Bedirxan

# Kulîlkên Ezêb

(Şiîrên Hawarê)

avesta

# ÇEND PEND

*Nakes hemî bûne mîr û axa*
*Yê ev kirî mala wî ne ava*

*Rabe here nik heval û kalan*
*Da tu nekevî newal û çalan*

*Dermanekî çêke bo birînê*
*Da tu nekevî di nav nivînê*

*Emîn AlîBedirxan*
*(BavêKamiran Alî Bedirxan)*
*Hawar Hejmar 9,*
*30 Îlon 1932*

## XATIRXWAZIYA MEMÎ

Mem got, dê kerem ke ezbenî tu
Dêka min î tu, ne bay î wek dû

Qedrê te erê gelek giran e
Mem qedrê dêya gelek dizane

Ser pêsîr û sîng û paşila te
Germî kê dida, tinê dilê te?

Dadê tu yî tu, tu dadika min
Destê te hejand mehdika min

Alos î erê, erê tu dê yî
Fêkê te ıne, ez tu dar û ra yî

Dadê megirî xwedê piyar e
Lawê te ye Mem ji dê re yar e

Mak î erê tu, tu yî dilovan
Lingê te de Mem peşîb e, qurban

Iznê bide min ko dilbirîn im
Dadê ji te re keça te bînim

*Hawar, Hejmar 1*
*15 Gulan 1932*

## XANÎ

Ew nûr e, herê li erdê şihrê
Şihra me ye, şihra bendewarî

Seydayê me ye, melayê yekta
Ava kiriye bi şor, qesran

Parîsê gulî bi şorê kurdî
Ava te dukur melayê Xanî

Bê zêr û kevir, ji pêta arî
Ava te dikir serayê şihrê

Gewher ew e, ew û can e bistam
Destpêkire ew û da ew encam

Ruhnahî te da, li erdê kurdan
Ruhnahiya te, delala yezdan

Hêvîn tu î, tu çavê sayda
Ferzane î tu û lawê mewla

B'sazê, te dikir, te da wê cûşiş
Ey hişvekiro! Te da wê xwahiş

Şeştarê te ye, ko da me zanîn
Firdews li kû ye, bihar û havîn

Gul, bilbil û ney meqam û jale
Tev de dikirin fixan û nale

Zêrker tu î tu ne pîlewer tu
Seyda yî herê û ser hiner tu

Meywa te xweş e û avdar e
Wek Xanî kî ye? Tu kes nikare

Bercîs tu î tu, tu rêberê me
Textê te di dil û ser serê me

Tirba te ne ax e, canê Xanî
Tirba te dil e û cawîdanî

Rehmet bi te ye û pesna Yezdan
Heyrana te ne, xulam û xaqan

*Hawar, hejmar 2,*
*1 Hezîran 1932*

## LALELAV

Xwedan malî, xwedan perde
Cihê te geş, hemî erd e
Bi awazî, tena denga
Te xuliqandî, te kir ava
Tu hem derdî, tu hem darû
Te kir meh ro te kir şev ro
Te naxafa, te naxurde
Tu davêjî dilan perde

Ya reb tu heyî, tu rehm û nûr î
Tu destek î tu hesin û şûr î
Tu rehm î, tu efserê mela yî
Gencîneyê tev, şeh û geda yî
Ya reb tu î, tu şahê dewran
Textê te li ser stêr û ezman
Textê te ser efserên şehan e
Bejna te ji çavê min nihan e
Ser çend şehan tu bûyî xunkar
Lewra ne dikir tukes jî înkar
Ya reb tu î tu padişahî
Tu merhema her birîn û ahî
Bexşende tu î lê derdmend im
Serferişk î mam û jar û bend im

*Hawar, hejmar 3*
*15 Hezîran 1932*

# MA ÇIMAN DİÇÎ

*Ji Ekrem Beg re*

Dilketî me, dîl im ez, dotmîr û fermandarî tu!
Sal û hîv herdem tu î, hem rovejîn hem rohilat,
Dîl im ez, dîla welatî; ez jî qurbana te me,
Gewre ye hêvîn û jîn, lê gewretir al û welat!..

*Hawar hejmar 3*
*15 Hezîran 1932*

## YEKBÛN Û YEKÎTIYA KURDÎ

Ew Lor û Bextiyarî Baban
Kurdmanc û Hevreman û Zazan

Kurdên ji welatê Rom û Sorî
Kurdên Ecem û Iraq û Sûrî

Kurdên ji welatê jor û jêrîn
Serçav bilind û zexm û nêrîn

Kurdên ji Blûc û Kurdên Efgan
D'hêvî de yek in û yek di raman

Yekbext in hemû, ne bextiyar in
Ser erd û dinê, liyan û jar in

Zerdeşt bû melayê kevnê kurda
Qanon bû çiraya Zendavesta

Ew felsefeya qadîm û pir nûr
Zendî, zimanê kevn û meşhûr

Zerdeşt û çiraya zîvê Zerdeşt
Ruhnî ew e, ser çiyan û ser deşt

Her kat ji kitêba Zendavesta
Pêtek bû li dil, gurî di desta

Ristem ji me ye û Şah Nadir
Siltan Selahadînê denggîr

Xanî û Melayê Batê, Teyran
Gî kurd in hemû, ji xwîna kurdan
Nabî ji me ye û Şêx Ehmed

Hîmê me ye Zend û dewleta Med

Agrî, Sîne, Wan û Mûş û Zîlan
Kanî ne, ji wan vejîne xortan

Sinî, Elewî û Eyzedî çî?
Em bûne xulam û mane birçî!

Kurd in ne cuda ji dar û ra ne
Bin destê Xwedê û yek Xwedan e

Kurd in hemû em, ji yek nijad in
Tev dad û kerem û pak nihad in

Bextên me yek in, ne sê ne çar in
Em Kurd in û tev bira û yar in

Agrî, Sîne, Wan û Mûş û Zîlan
Kanî ne ji wan vejîne xortan

Sinî, Elewî û Eyzedî çî?
Em bûne xulam û mane birçî!

*Bêrûd, 23 Gulan 1929*
*Hawar, hejmar 4*
*3 Tîrmeh 1932*

## ŞÎN Û PESNA ZÎNÊ

Bilbil û gul, parîzê Botan û rengê çav û meng
Bin siha şîn û keser wek hêstir e, hawar û deng

Pilpilî, kokiyê zer, nêrgiz benefş û lalezar
Wek nivîna Zîna Zêdan, nalenal û giryezar

Ev stêrên zêr û zîvîn ruhniya erd û dinê
Bin pêyê bawişkê Şînê bîr kirin hej û kenê

Dengê kund û bûm, eylo ser çaxa buhar
Ser newal û fêd û kanî hêstirek bû aşikar

Destê reş, qey hilçinandî, rûyê tavê ser zevî
Yek kevanjen, hat û avêt ser dinê tîrê şevê

Ney dinale, solîn û mêrg, parêzan guhdane wê
Şahiya dil, deng û govend nav keser çû û revî

Nûbuhar, havîn û payîz û zivistan jî nema
Dora wan çaxa ketin, lêlan û berf û ah û ba

Nikil û teyr û dadika dunîkilan
Distrên paxendê wan, Zîn ket li çalan û kelan

Gevre ye ev şîna Zînê, Zîna Zêdan giryedar
Bêheval in gul û bilbil, bêheval e lalezar

Ruhniya Ewrex û Dêrgul, ruhniya Burcabelek
Ruhniya erdê Cizîrê, ruhniya Qesra Felk

Ruhniye efser û tac û ruhniya rexta nivîn
Ruhniya carî xulam û ruhniya Adar û şîn

Ruhniya Tacîn, Çeko û ruhniya mîrê Ezîn

Ruhniya parîzê jînê, ruhniya jar û hezîn
Ruhniya xizan û sêwî ruhniya ezman û çeng
Ruhniya Polad û Ristem, ruhniya çavan û reng

Ruhniya kanî û hurî ruhniya bihna buhar
Ruhniya bîcade, gewher, ruhniya zîvînîtar

Ruhniya erdê welat û ruhniya ar û bihuşt
Ruhniya av û çîman û ruhniya dar û bihuşt

Ruhniya zimridê Xusrev, ruhniya bistamê Key
Ruhniya ney û blûr û ruhniya paxendê mey

Ruhniya seyda, hewarî, ruhniya firdewsê bext
Ruhniya hêlîna jaran, ruhniya ekwan û text

Ruhniya nermî, delal î ruhniya rêl û çiyan
Ruhniya şêr û piling û ruhniya mêrg û giyan

Ruhniya hêvîn û pêtan ruhniya Efrasiyab
Bendeyê Zîn e firişte, bende ye Tehmasiyab

Ruhniya sor û sipî û ruhniya zer û heşîn
Ruhniya pîr û ciwan û ruhniya hawar û şîn

Merhema hêstir û jarî merhema çaxê xirab
Merhema ah û birîn û merhema kalan û bab

Zîna Zêdan, Zîna ezman, Zîna nêreng û delal
Zîna xortan û firişte, Zîna çav û bab û kal

Dilketî ye Zîna Zêdan, dilketî xortan û pîr
Ser dilan hêvîn şah e, efser e, ser şah û mîr

*Hawar, hejmar 5*
*20 Tîrmeh 1932*

## WELATÊ KURDAN

*Ji Zîn û Mem*

Dicle û Ferat û ava Xabûr
Dengîn.. di ser dinê de meşhûr

Firdews e diyarê ap û xwalan
Axa wê nivîna bav û kalan

Ser Bozêrewan û zînê xweşreng
Mem lez dibezî ser ewr û ser meng

Bajar û gund qesr û burcan
Gî dilxweşî ne bi şewq û şadan

Ava ye bi reng û dewlemend e
Ser erd û dinê jî bêmenend e

Her cih bi eşîr û kaniyên çak
Hêlîna welat û şadiyek' pak

Îlon, Tebax, Tîrmeh, Adar
Nîsan û Gulan û cot û bazar

Her rûj û heftî hêv û salan
Dîroka welat e rûpelên wan

Bav û kur û keç û mam û pismam
Pismam mirin di şopa dotmam

Kurdmanc teva mirovên hev bûn
Yek jî ne cuda hemî jî tev bûn

Cotkar û şivan bi ken kirin şor
Ser mêrg û zewî û solinê sor

Parone û ga û golikên reş
Gamêş û medek gedek hemî geş

Hogeç û bizin û berx û nogen
Wek av û co sipî û rewşen

Cih cih bi bihuşt zmanê kurdî
Cih cih bi meqam û zarê kurdî

Ava ye welatê kurd û kurdan
Gencîne ye Zîn û çavê Alan

*Hawar hejmar, 6*
*8 Tebax 1932*

## BIRÎN

*Şêr bi lepê xwe*

Mêrg û zevî xirbe ne
Gund û qesr tirbe ne
Bilbil mirî gul mirî
Ne rez maye ne tirî

Ne gul û ne kulîlk man
Ne parîz û gulistan
Ne dengê xweş ne meqam
Pêve j'ah û intiqam

Çavên bûkan b'hêstir in
Kund digirîn distirên
Ne pez mane ne şivan
Ne blûr û blûrvan

Gelî, Çiya guwah in
Ne xulam in ne şah in
Deşt û newal bi xwîn in
Dîroka me dixwînin

Rêl û dehlik bûne zer
Zêvî bûk in kezîzer
Xwelî bûne xerabe
Yezdanê me de rabe

Bi camêrî nikarin
Bi bêbextî dikarin
Em jî ker in û kor in
Ji pira wan diborin

Ne qesr ma ne serban
Ne mîrek ma ne siltan

Ne saxî ma ne mirin
Hîmê me jî dibirin

Ken vemirî girîn ma
Derman çû û birîn ma
Keçik çû û kezî ma
Û aheke rizî ma

Gulistan bû kevristan
Ber çavên Kurdistan
Arîkarê me nîne
Hêvî! Çirakê bîne!

Çavê Binefş heşîn e
Sosin jî ket, bişîn e
Ne giya ma ne rêhan
Li parîzê Kurdistan

Ne ma lê lê ne lo lo
Qirik, kund, gur û eylo
Dikenin xudan saz in
Kezeba me dixwazin

Mêrg û zevî xirbe ne
Gund û qesr tirbe ne
Bilbil mirî gul mirî
Ne rez maye ne tirî

Hawar çû û hêstir ma
Nijdî mir û hêştir ma
Mamik kur û dirêj e
(Şêr b'lepê xwe) dibêje...

*Hawar hejmar 7*
*25 Tebax 1932*

# STRANA DILAN

Lêvên te du pêt in
Çavên te stêr
Diranên te mirarî
Dilê te dêr

Ava bi ronahî
Wek Zerdeşt î
Dinê û ezman î
Mêrg û deşt î

Sor î rohelat î
Deng û nay î
Buhar û blûr î
Brûsk û ba yî

Porên te zêr û zer
Canê te zîv
Tu bibe ji min re
Taştê û şîv

Taûsê arper î
Kenîna bûk
Bikene dimirin
Bakur û pûk

Tu ewrên ezman î
Tu keskesor
Li ber lamên te lez
Dimire sor...

Tijî hêvîn tu î
Hesret jî tu
Zana û ferzane
Şîret jî tu

Çûkeke delal î
Dengekî çak
Kaniya zelal î
Wek berf î, pak

Xwesteka min tu î
Strana min î
Mêkewa min tu î
Şivanê min î

Xezala min tu î
Çavên te reş
Ez beranê te me
Sînga min geş

Pêşnivêjê te me
Tu mizgeft î
Dilê min ezman e
Tê de stêr î

Di çavê' roj û hêv
Ronahî tu
Li qesra spehiyan
Avahî tu

Sînga te çiya ye
Tu agir î
Li buhiştê hêvîn
Pêxember î

Bêkes im û tinê
Û bê dotmam
Di vê dinyayê de
Bê govend mam

Kulîlka Adar î
Bihna buhar î
Tu deng û hawar î
Stêra êvar î

Pêşnivêjê te me
Tu mizgeft î
Dilê min ezman e
Tê de stêrk î

Porên te zêr û zer
Canê te zîv
Tu bibe ji min re
Taşê û şîv

*Hawar hejmar 8*
*12 Îlon 1932*

## ALA KURDAN

Ronahiya dil û çav
Diyariya dê û bav
Pêsîra wî roj û tav
Spehîtiya ax û av

Ala kurdan ser be ser
Sor û gewr e kesk û zer

Qehremanê ceng û şer
Qiblegahê mê û ner
Cayegahê can û ser
Afitaba dar û ber

Ala kurdan ser be ser
Sor û gewr e kesk û zer

Hêviya xortan û mêr
Mihreba mizgefet û dêr
Şahê evd û şahê şêr
B'reng û bihn e zîv û zêr

Ala kurdan ser be ser
Sor û gewr e kesk û zer

*Hawar hejman 8*
*12 Îlon 1932*

## DILKOÇERÊ

Çavên te xweş heşîn in
Çima bi xem bi şîn in
Dengê te nerm zelal e
Biken' bibêj' menale!
Rêl ez im tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

Delala min tu naz î
Dengşîrîn î bi saz î
Bi çavên te dinê geş
Sînga te gul, gulîreş
Rêl ez im, tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

Tu aheng î b'lûr î
Tu alûs î bi nûr î
Ez dil im tu germî yî
Xurt ez im, tu nermî yî
Rêl ez im, tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

Ez Gulan im tu gul î
Tu ahengê bilbil î
Ez birîn im, tu derman
Ez Qurban im ez heyran
Rêl ez im tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

Deşta dil de ask tu î
Hişê min re bask tu î
Çavên te xweş heşîn in
Çima bi xem bi şîn in?

Rêl ez im tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

Salên te hê ne hejde
Di refê spehiyan de
Dotmîr î, bûyî serek
Xulamê te me bê şek
Rêl ez im tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

Tu dotmîr î û mîr î
Şehyane yî bi jîr î
Dengê te nerm zelal e
Biken' bibêj menale!
Rêl ez im tu bihn û reng
Dilkoçerê b'nav û deng

*Hawar hejmar 9*
*30 Îlon 1932*

## KURDISTAN

Êvar e
Pir sar e
Çol e, gir û çiyan bê dar in
Tarî ye
Zarî ye
Bê te dil û can birîndar in

Welat e
Şewat e
Hêstirên min dikevin; çem e
Dîlê min
Dilê min
Êdî were delalê! dem e

Mamiz î
Bi saz î
Kaniya stêr bû dilê min, mir
Hejkirin
Tum birîn
Xwelî bûn ne ma pêt û agir

Adar e
Hawar e
Camêr tev dimeşin, bê Al in
Stran û deng
Gul bê reng
D'mehdikan de zaro dinalin

Gir û ber
Qrên û şer
Top û tifing diricifin... Ah!
Ax û dar

Gî xwîndar
Ne mîrek ma ne siltan û şah!

Kel û gund
Cihên kund
Jin û keç burc û qesr gî kêmbext
Li gorinan
Berazan
Bûk jî mir, ne ma serîr û text

Talî reş
Bîst û şeş
Lê dil ne mir ne bû ax û rijî
Hêstir reş
Sîng, dil geş
Canên me gî camêrî tijî

*Hawar hejmar 9*
*30 Îlon 1932*

## HIŞYARÎ

Ne ceng û şer, şeva tarî, ne mêranî, ne Kurdistan
Dilê min zexm û nêrîn e bila her cih be goristan

Ne ma govend, ne ma zurne, ne ahenga dilê xortan
Keser û giş kul û nale, bi xem mehdik bi xem Botan

Ji hêlkê ax û hawar e, ji hêlkê xwîn û kortal e
Ji hêlkê laşê xortan in, ji hêlkê dengê qertal e

Ji hêlkê zaroyên sêwî, ji hêlkê jin û jinûbî ne
Ji hêlkê sed birîndar in tu kes naye û nabîne

Hevalê bûk û destgirtî ne ma qesr e ne ma hêwan
Hevalê jin û dê êdî şeva tarî û goristan

Ne ma Ewrex, ne ma Dêrgul ne man dengbêjê Kurdistan
Ne ma bexçe ne ma sosin ne ma mamiz ne ma zozan

Ji hêlkê laşê zaroyan ji hêlkê destgirtî
Kuro rabe, bi camêrî çima nayî çima sist î!

Hevalê hev bibin êdî hevalên hev birayên hev
Hemî mêr in hemî kurd in hemî yek dev

Ne botî me, ne xerzî me xulamê axa Kurdistan
Ne mîr im ez ne axa me peyayê dewleta kurdan

Welatê min tu î gevre bi nav û deng şehînşah î
Tu mîr î hem tu axa yî tu hem sultan û hem şah î

Buhişta erd û ezman î çiraya dil tu î armanc
Hemî dîl in xulamên te heçî kurd in heçî kurdmanc

Bilind î tu welatê min, welatê bav û kalên pak
Tu xweşbihn î tu xweşreng î tu xweşdeng î welatê çak

Bi gul û rez bi deşt û gir bi qesr û burc tu ava yî
Tu sîng û pêsîra mak î tu î mehdik û ewra yî

Welatê min biken êdî hemû kurmanc ji xew rabûn
Bi rûyê te, bi çavê te dilê kurmanc hemî şa bûn

Ciwan in lav û dîlên te bi hevîn dil gelek xurt e
Rêya me dûr û dijwar e bi hêvî rê gelek kurt e

Tu rêber be tu fermanber em in leşker em in esker
Xudanê evd û îman in bi izna Yezd û pêxember

Ji bo me roj û hêv êdî çira ne pêt û ronahî
Qirênê kurd û Kurdistan bi zanîn e bi avahî

Xweyî dîrok xweyî esl in me da zanîn me da Zerdeşt
Welatê kurd gulistan e, gulistan in evî û deşt

Welatê min, welatê xweş, welatê pak Kurdistan
Tu hêlîna ciwan û xort tu î gewher li Xuristan

Dinê geş bû û talî geş û tirb û gorn ji dil şa bûn
Welatê min biken êdî, hemî kurmanc ji xew rabûn

*Hawar, hejmar 10*
*1–23 Çiriya Berê*

## ZMANÊ MIN

Kurdmancî zmanê bav û kal e
Tirba xwe de, dê bi wê dinalê

Kurdmancî ye deng û pirsa pêşîn
Kurdmancî bê deng û pirsa paşîn

Sor, gewr û kesk bir rengê kurdî
B' Kurdmancî, tinê, bi dengê kurdî

Bavê min û dadika sipîpor
Banî me dikin ji tariya gor

Kurdmancî zmanê bav û kal e
Tirba xwe de, dê bi wê dinale

*Hawar, hejmar 11*
*1–10 Çiriya Paşê 1932*

# MEŞHEDA IBRETÊ

*Şêx Evdirehmanê Garisî çû rehmetê*

Melayê min û şêxe min melayê erdê Kurdistan
Şehîdê erd û ezmanî Gozge û Botan

Ji bo milet ji bo kurdan; fidabûyî, tu qurbanî
Şehîdê eşq û îmanê, şehîdê rizm û mêranî

Welatê te melayê min, welatê pak Kurdistan
Ne Gozge bû, ne Şernex bû, welatê te ne jî Botan

Ji bo namûs û camêrî, ji bo milet fida bûyî
Ji mîrên te, jimêrên te, ji nişka ve cuda bûyî

Riya milet û dînî de, bi mêrxasî tu bûyî qurban
Meqamê te buhiştîne, bi emir û gotina Quran

Di ezmanê Amîdê de, tu (Bercis) bûyî tu
kewkeb bûyî
Ji bo yar û ji bo dijmin, ji bo kurdan tu bi
kerb bûyî

Riya din û welatî de, qelemkêş bûyî û şûrkêş bûyî
Ji bo milet ji bo kurdan bi ezim û rezim
ji çira bûyî

Ji bo laşê te şêxê min mezare axa Kurdistan
Dinê tirba te şêxê min û gorna te dilên mêran

Ji bo kurdan ji Gozge ew peyamek xweş diyarîbû
Bi mêranî û camêrî bi her tiştî dikarî bû

Ji bê bextî me safî kir, li bêbextî xulam in em!
Ji bê bextî perîşanin û bê dewlet zilam in em!

Çeleng bû mêr û jêhatî, bi tevdîr bû û zîreb bû.
Bi nav û deng bi xwîn û reng bi her tiştî
mubarek bû

Bi şorê te bi pirsa te bi ilm û rifet û xîret
Tu bûyî rêber û tirba te (ji) hemîne meşhede ibret

Birîndarin te derman kirim, birîndaret tu kuştî ax!
Ji nû ve hêstir û matem ji nû ve can û dil kambax!

Bi mêranî û gernasî tu buyî seyda tu bûyî rêber
Delalê mêr û camêran delalê reb û pêxember

Bi mala te, eşîra te hemî milet birîndarin
Girîn û ax û zarîn e, girîn û ax û hawar in

Tu seyda bûyî, tu bûyi bavik, tu bûyî kurê ta
bûyî armanc
Feqehên te birîndar in, birîndar in hemî kurdmanc

Ji nû ve şahiya dijmin, ji nû ve gur û seh şabûn
Bi tirba te, lê şêxê min hezaran kurd ji xew rabûn

Tu alî, goreyî ay şêx, tu roja hêviya milet
Tu alî, goreyî ay şêx, tu kanî bûyî ji bo himet

Tu alî, goreyî ay şêx, tu tirba qudseya kurdan
Bi anîn û bi camêrî de rabe êdî Kurdistan

Mirina te û penda te vejînin miletê kurdî!
Feqehên te peyayên bijînin milete kurdî!

Tu alî, goreyî ay şêx hişê mîr û feqehan bûyî!
Serê te ji axa Kurdistan rehê te ji axa Botan bû!

Tu alî, goreyî ay şêx tu ala meşheda kurdan
Tu pelkê zîv û zêrînî ji dîroka dilê xortan

Tu dîroka şehîdanî tu serborîna Kurdistan
Sibe qurbana şêxê min dibin sed destên
Cenkîz–Xan

Delalê axa kurdan î, delalê axa Kurdistan
Tîmorling nekir wisane, kir wisan jî Cenkîz–Xan

Tu sultanê dil û çav î, tu sultanek hiner bûyî
Bi şor û ilm û şêranî, tu seyda bûyî tu rêber bûyî

Melayê min bibêjim çi, ji pirsan pir mezintir tu
Melayê min bibêjim çi ji canan pir mezintir tu

Tu çuyî, pir jî sêwî man, dilê milet jî ma ba te!
Melayê min bibêjim çi dilê min bûye tirba te!

# HEYV Û STÊR

Îşev şev e, bi şev e
Dê digirî tirba xwe ve
Heyiv derket stêrka xwe ve
Dilketî me û sîngjar im
Bê welat û bêbajar im

Erdê xwe re ez heyran im
Birîndar û bêderman im
Ji kurdan re ez qurban im
Dilketî me û sîngjar im
Bê welat û bêbajar im

Bêxweyî me ez tinê me
Yek ji camerên dinê me
Ji bêbextî ez ketî me
Dilketî me û sîngjar im
Bê welat û bêbajar im

Îşev şev e şev bi şev e
Bavê min tê gora xwe ve
Heyiv derket stêrka xwe ve
Dilketî me û sîngjar im
Bê welat û bêbajar im

*Hawar, hejmar 12*
*27 Çiriya Paşê 1932*

## PEHÎZ

Pehîz e dil pehîz e
Dinê tarî bi zîze
Pelên daran girîn in
Cendekên wan birîn in
Gul ne xwîne bi xwîn e
Wek birîna hevîn e
Pelên daran li deştê
Qey eskerên şiketê–î

Ezman reş e bi ewr e
Dinê herî bi cewr e
Koçera min tu î bûk
Badev î bazor û pûk
Ne golik û ne berx ma
Dinê sar e û serma
Pehîz e dil pehîz e
Dinê tarî bi zîz e

Dinê berf e û ba ye
Qey rondik û dua ye
Dinê berf e û baran
Tu deng naye ji Botan
Şirnex li kû ez li kû
Ewrex li kû ez li kû
Pehîz e dil pehîz e
Dinê girîn û zîz e

Ne kêvroşk û nêçîrvan
Ne zozan û bêrîvan
Ne mast û dew ne savar
Dinê tarî û êvar
Ne kon û ne xêwet ma

Tinê sarî û serma
Pehîz e dil pehîz e
Dinê hêstir û zîz e

Dinê tarî û dil sar
Hemî bê dost û bê yar
Zelam rûs in û rûs dar
Rondik, girîn û hawar
Girîn in her girîn in
Can û kezeb birîn in
Pehîz e dil pehîz e
Dinê tarî bi zîz e

*Hawar, hejmar 13*
*14 Çileyê Berê 1932*

## GULÊ

Ne tîr û ne xencer bû
Ne mar û ne ejder bû
Bihna Gulê ez kuştim
Ne şûr û ne şeşder bû

Ne kanî ne robar e
Dinê êvar û sar e
Rûyê Gulê ez kuştim
Erd evraz e û xwar e

Dinê bêdeng û zer bû
Û tirba min li der bû
Çavên Gulê ez kuştim
Ne êriş bû ne şer bû

Çiya berf û dûman e
Gul û sosin ne mane
RengêGulê ez kuştim
Yê dimire beran e

Gulê bêdil û bêcan
Gulê hakim û sultan
Sînga Gulê ez kuştim
Gulê rovî û şeytan

Gulê bêdeng û bênaz
Gulê bêkîr û awaz
Dengê Gulê ez kuştim
Gulê govend Gulê saz.

*Hawar, hejmar 13*
*14 Çileyê Berê 1932*

# WELAT Û DILÊ MIN

Ev çend sal in dilê min qet ne geş e
Dinê tarî, dinê êvar û reş e

Dilê min qet, ne ava bû ne bû geş
Buhara min, pehîza min hemî reş

Di çolê de, di deştê de tinê me
Qey rondik im; qey ez şîna dinê me

Xweş buhar e, lê xerîbî jarî ye
Min çi kir ko dinê li min tarî ye

Min çi kir ko zaroyên min mirine
Û ronahî ji çavên min birine

Bê xanî me bê tilik im; bê welat
Her ji min re maya bêbext rohelat

Min bûk ne dît, zaro ne dît ne dît al
Porên min gewr e pîr bûme, bûme kal

Welatê min biken, tiştkî bibêje
Lalbûna te çima hevqas dirêj e

Çima hevqas; tu bêdeng î û bê nav
Bila bibin; goriyên te sih û tav

Welatê min biken biken megirî
Ji bîra te hêj derneket Agirî

Kemal Fewzî, Extî, Fiad ne mirin
Ji nû ve ew; rêya te de dimirin

Ji nû ve ew, ji tirbên xwe radibin
Ji nû ve ew, dimirin pê şa dibin

Sînga te de veşartî ne çend hezar
Çend hezar jî bê gund mane bê bajar

Çend hezar jî sêwî mane û bê mal
Text jî çû ye, bext jî çû ye ne ma al

Lê bawerî sist ne bûye nabe jar
Kelên te ne tev gundê me tev bajar

Kelên te ne sîngên kurd û kurdmancan
Mirin nîne bo giyanê ermancan

Bawerî qet mirin çi ye nizane
Jiyîna wê bêmirin e dizane

Ava bibî, serxwe bibî megirî
Ji bîra te hê derneket Agirî

*Hawar, hejmar 14*
*31 Çileya Berê 1932*

## HENEK

Dilo rabe buhar e
Kesk û sor e bi dar e
Dinê germ e ne sar e
Dilo rabe buhar e

Mêrg û solîn zozan e
Êda keç û qîzan e
Havîn bavê xîzan e
Mêrg û solîn zozan e

Ne berf maye ne baran
Ruhnî kulîlk li daran
Bû keyfxweşî li jaran
Ne berf maye ne baran

Çem bi av û stiran e
Te jî pez û beran e
Dinê xort û ciwan e
Çem bi av û stiran e

Ga û golig heval in
Welatê wan newal in
Hemî xort in ne kal in
Ga û golik heval in

Heyiv derket zebeş e
Erd û ezman ne reş e
Dinê bi ken û geş e
Heyiv derket zebeş e

Heyiv zebeş tu rêhan
Ez dilketî tu qurban

Ez kirêtim tu heyran
Heyiv zebeş tu rêhan

Mêw ez im tu î tirî
Mih tu î ez im hirî
Te firot û min kirî
Mêw ez im tu î tirî

Ez kanî me tu av î
Ez nêçîr im tu dav î
Şevreş ez im tu tav î
Ez kanî me tu av î

Ba û baran pehîz e
Dinê bi xem û zîz e
Delala min bilîze
Ba û baran pehîz e

Ne derew e ne kenîn
Ne bexçe ye ne cinîn
Tu svwar î ez im zîn
Ne derew e ne kenîn

Tu buhişt ez dergevan
Kêr tu î ez im qurban
Gorî te me ez heyran
Tu buhişt ez dergevan

Kul ez im tu hêstir î
Tu ji periyan çêtir î
An zêrî an zêrkirî
Kul ez im tu hêstir î.

*Hawar, hejmar 14*
*31 Çileyê Berê 1932*

## KULÎLKÊN EZÊB

Ez bes te maç dikim; bi lêvên xewnê
Hevîna te kûr e, hêviya dinê

Brûskên çavên te; wek gewherên ecêb
Çavên te ên zelal; kulîlkên ezêb

Maça şêrîn; ko lêva te bi min da
Ez birîndar kirim û bi min ve da

Çira dişewite; zimanekî zêr
Her pê ruhnî dibe, nimêjgah û dêr

Bo tihniya dilî; lêva te kanî
Ji xewna çavê re; te sorgul anî

Dilê min mizgefta bêdengî ye; sar
Havîna min bê sih, rêlên min bê dar

Mehfûra mirinê min bi ken raçand
Jînê ez xapandim, min kes ne xapand

*Hawar, hejmar 15*
*23 Çileyê Paşê 1932*

## HOTVÎN

Rûyê te çeleng e lêvên te gulreng
Çavên te stran in lê, bê gotin û deng

Çermê te spêde ye binê wî de tav
Lamên te rohelat spehî yî bê nav

Lêva te sûlava maç û ramûsan
Bi sînga te dilê min çiqas kamiran

Buhara eşq tu î, havîna hevîn
Rûj hene derman î, rûj hene birîn

Birîna xortan î armanca mêran
Navê te dengîn e qedrê te giran

Dil, can direcifin maça te agir
Tu wek bager xurt î, wek zinar û gir

Lêvên te bi gul in devê te şêrîn
Dengê te wek tîr e, maça te birîn

Lêvên te piyan in devê te şerab
Te ez kirim xulam, te ez kirim xirab

Çavên xwe vedikî roj derdikevin
Pora xwe vedikî buhar dikenin

Devê xwe vedikî mirarî û gul
Goşt digire birîn û xweş dibe gul

Bê te; ji bîr dikim; zaro, bav û dê
Wek çûkên birîndar dikevim erdê

Jiyîn bi te re bext, bihn gulistan
Kulîlk î ji ax û erdê Kurdistan

Birîn... birîna te şêrîn û geş
Bê te dil tarî ye û can dibe reş

Destên te de saz im; ranên min tar in
Xulamê te bûm ez ev hezar car in

Stêr, bext, armanc tu î, av, şerab û dew
Geh rast e biken geh bi girîn derew

Ez bê te nikarim canê min têşe
Bê te sîngjar dibim jîna min êş e

Bê te ji bîr dikin zaro, bav û dê
Wek çûkên birîndar dikevim erdê

*Hawar, hejmar 15*
*23 Çileyê Berê 1932*

## STRANA ÇIYAYEKÎ

Hişê min aza ye, dilê min bê bend
Minet min navê qet min nedît merbend

Bagir, bandev û berf, çiya, kaş, pal, zinar
Ew heval û hogir in, bi min dost û yar

Wek rûhiyê aza me, wek reng û deng
Min minet nexwest, lora ez mam dereng

Qertel û baz hem, li ser berf û çiya
Stêr kulîlkên min in bi mêrg û giya

Xwedê rastî ye ho... Heqê min Xwedê
Heqê min delal e wek bav, bira û dê

Bagir, bandev û berf, çiya, kaş, pal, zinar
Ew heval û hogir in, bi min dost û yar

*Hawar, hejmar 16*
*15 Sibat 1933*

# LI BER TIRBA ŞÊX SEÎD

Sura êvarê lêva xwe hêdî hêdî digehîne tirba te.
Bêdengiya wê demê de tenê dengê te tê bihîstin.
Eniya min giran û tarî, rûyê min sar û dilê min hişk e, hatim ber tirba te rawestiyame.
Kêlâ te nabînim, axa te hêj nerm e.
Tirba te ne navkirî û bêrewş e.
Navê te bi Berfên xwîndar û ruhn, li ser rêya Pîran Xarpêt û Diyarbekrê de nivîsandî ye.
Navê te li ser pola û hesin, ser ferş û li ser dilê camêran de diçirise û dibrûske.
Ev çend sal in ko çêbûye, lê niho jî, ji navê te dijmin dilerize.
Rêç û şopa pêyên te di deşt û çiyayên Kurdistanê de tên dîtin. Tu dîroka me de veşartî, dilê me de xuya yî.
Drêjahiya tirba te sê gaz in. Zarokek bi pêyên xwe ên kiçik di bihnekê de dikare wê bipîve.
Ji tirba te îrû tu deng naye. Dijmin pê li tirba te dikin.
Ezmanê me reş û bi ewr bû, tu wek brûskekê jê derket û lê daketî.
Min tu li ser kopekî bilind dîtî, di ber lingê te de geh ava Dicleyî a bikef û geh ava Feratî a bixwîn diherikîn.
Niho jî ez te bi çavê dilê xwe dibînim. Rû û eniya te zer in. Çavên te girêdayî ne, sînga te brîndar e, te xwe dirêj kiriye lê tu nanivî!
Tirêjên rojê nagehin te. Lê gorna te ne tarî ye. Jê ruhniyeke ecêb derdikeve, ruhniyeke lûleper, ew ruhnî dilên kurdan ji hevîna welêt tejî dike.
Xaçerêyên hişên me dibin rê û şehrê.
Barana çiloyî li ser tirba te dibare; dar û kulîlk ji bo

te digirîn.
Li ser ala te bawerî; camêrî, rastî û bext nivîsandî bûn.
Dengê te, dengê azadiyê bû. Tu ji kenê welêt şa dibûyî û ji kenîna şûr û xencerên pola.
Wekê roj ji pişt çiyayên Pîranê derdiket û tava wê li çekên peyayên te dida rûyê te geş, dilê te şa dibû.
Tu bêken mezin bûyî. Şîna welatê te, dilê te de bû.
Tu bê ax û girî çûyî.
Te tola xwe ji çêliyên Kurdistanê re hişt.

*Hawar, hejmar 17*
*6 Adar 1933*

## STRANA GULÊ

Gulê!! Dotmîrá kulîlkan, mirariya parîzan serrewşa bihnûniyan tu î!
Tu şehmerşaha delalan, bihna buhar û paîzan çelengiya bûk û bûkan î.
Rengê te çak, bîhna te pak şiklê te nazdar çermê te nerm e!
Serê memikan gotina keç û spehiyan, ruhniya deng û stranan tu î.
Di ezmanê kûlîlkan de roj tu î, bûkîkên te stêr in.
Her kes hêj te dike.

Gulê! Dezgîr tu î, bilbil dilketiyê te ye. Lê tu hêj wî nakî. Tu wek keç û jinên bajaran dilkoçer î.
Tu axaftinke bêdeng, lavijeke bê awaz sazeke bê meqam î.
Tu wek dev û lêvên dezgirtî û periyan sor û şêrîn î.
Her kes hej te dike.

Gulê! Bilbil digirî û lavelav dike û dibêje te:
– Were.. were ser singê min, e gorî te me, textê te pêsîra min e, li ser pêsîra min de rakeve, ezê bibim dergûşa te û ji te re serêlok û pehîzokan bibêjim.
Tu dikenî, guh nadî wî ew digirî!
Tu dezgirtiya pîr û ciwan, jin û mêran î.
Tu qesra kulîlkan de sultan î. Benefş, beybûn, gulnexwîn, rehan cariyên te ne. Mêvandara buharê û strana bihn û reng tu î.
Dildiziya Zîn û Mem tu î; Leyl û Mecnûn berdevkên te ne.
Her kes hej te dike.

*Hawar, hejmar 12*
*27 Çiriya Paşê 1932*

## KÛVAN

Brayê min! Min welatê xwe, wek tiştekî delal, ko mirov bawer kiri bû dê winda bikira, bi hez û hesret û bi bêriya dilî himbêz kir. Ez wek pelên darên pehîzê, di destê bayê de lehîstok bû bûm.

Brayê min! Min bi fikra welêt û hêvîna wî ji dil û canê xwe re qesrek ava kir û min ji mala xwe re bûkek anî, bûkeke spehî û çik û navê wê kir armanca Kurdistanê.

Brayê min?! Canê min, bi dil û kezeba xwe ve, bi jîn û hişê xwe ve, ji welatê xwe re sundên bext û dilrastiyê xwar.

Brayê min?! Heke hez û hesreta min li pey axkê ye ko min tucar nedîtî û bihnekê ye ko min tucar bihn nekirî, lê min ew bi çavê dilê xwe dîtiye û bi bihna xwîna xwe sehkiriye, ji bîr meke.

Brayê min?! Ew tiştên ko berî tu hînbûyî nuho ji bîr bike û bavêje ji dilê xwe.

Ew tişt sar û tarî ne. Ji nuho ve dil û hişê xwe bêxe ser tiştên nû, vegere ser zmanê xwe û ji dil û canê xwe re germî û ronahiyê bîne.

Brayê min?! Kaniya dilê min ne zuwa ye. Pelên darên canê min zer ne bûne. Por û pirçên min gewr in lê di ruhê min de bayên buharê liba dibin.
Heyîn û neyîn di destên me de ne.
Tu dixwazî ji dil û canê xwe re şabûnîkê nenas û nedîtî bibînî?!

Hej welat û miletê xwe bike û xwe bêxe ser rêya wan.

Brayê min?! Ew şêst sal in dil û canê min ji xem û keseran westa ne.
Ez di dinyayê de pey hez û şabûniyê geriyame.
Di derengiya şevan de min kitêb vekirin û min bawer dikir ko ez pey şabûniyê de me.

Min dereng, gelek dereng sehkir ko kitêban ez xapandime. Ew ne kurdî bûn.
Di gerana dinê de, dest û pêyê min dil û sînga min birîndar bûn.
Lê min nuho di tenişta kaniyeke zelal û di bin siha darên spîndar û bîşenga de, di rêya welatî de şabûnî peyda kir.

*Hawar, hejmar 13*
*14 Çileyê Berê 1932*

# ROJA NÛ

Kî qasî me dilhişk e û dilnerim
Kî qasî me sar e weke me gerim

Mal, mendal, bûk, zaro, jin nema kes
Bawerî, tol, kîn û şor mane, bes

Xwe dîl nexwest, hêsin afirand
Destê me bi xincer û şûr şidand

Şerê me sor e, destê me pola
Dost re gorî ne, dijmin re bela

Tirsa me ji Xwedê ye, hew... camêr
Zinar û çiyayên me jî xort û nêr

Rabe, bi kuje, bi mi re, felat...
Êdî dibînim, di kene welat

Tiştinin mezin çêbûn, dê çê bibin
Di bînim destpêdeke, rojke din

Roja nû bû dinyaya Kurdistan
Rengîn bû ezman û rengîn cihan

Şerê me sore, destê me pola
Dost re gorî ne, dijmin re bela

*Hawar, hejmar 18*
*27 Adar 1933*

# REVANDIN

Zerdelper e, bergehê çavan de, roj vemirî
Guleke sor di nav av û ezmanan de mirî

Dema hevîn û ramûsanê!! Ji bo dilketiyan
Her gotin dibe şêrîntir ne kul dimîne ne jan

Delal dikene, stêr dikenin û sura êvar
Sar dibe rêwingî ye li ser rêya gund û war

Zendên bi gurçik himbê dikin bejnên nermîn
Bayê şahiyê li ba dibe dermanê birîn

Bin siha daran de keçikek dike ax û hawar
Çavên wê tejî hêstir in spehî ye wek adar

Rengê wê dibe zer û sor lamên wê dibin germ
Çiqas şêrîn e rûyê wê, dilê wê çiqas nerm

Rûyê wê wek rohelata buharê; ter û tol
Xulama Xwedê ye, bi xwe jî xwey dîn û ol

Li çar dora xwe mêze dike bi tirs û guman
Deng naye, bi tinazî stêr dikenin li ezman

Ne reprepên hespan, ne ax, girîn, ne aheng
Dinê sar, wek mirî bêdeng, wek hewa bê reng

Dixwaze bin lingê wê de erd biheze, xwe veke
Ew jî bikeve, tê de wek mirîkê rakeve

Tariya şevê de sê çar suwar xuya dibin
Wek şehmêr û ejdehar in ji erdê radibin

Keçik xwe davêje ser hespekî; heyv dikene
Ne heyv tenê tariya şevê jî bi ken e

Keçik çû, revandin, "xwelî li ser wan pismaman"
Dimirin bê deng "namirin li rêya dotmaman"

*Hawar, hejmar 20*
*8 Gulan 1933*

# KOÇERA MÎRAN

Ho koçera min! Min bi maça devê xwe maç bike. Hevîna te ji şerabê spehîtir e. Bihna te bihneke şîrîn e. Dengê navê te wek roniya rojê belav buyê, ji lewre herkes hej te, hej sura bayê te dike.

Ho keça koçerê mîran! Tu esmer î, lê spehî yî. Tavê li rûyê te neyiriye, ji lewre tu esmer î. “Zêrê zer î xirab nabî, tu koçer î deştî nabî.”
Di nav kulîlkên sor û zer de kulîlka spehîtir tu î. Di nav jinên zirav û şîrîn û bi bejn û bal de a çelengtir tu î.
Di spehîtiyê de serdara serdaran û sertaca delalan tu î.

Sîngê te ezmanê min e, mirarî ser sîngê te de wek stêrkan diçirisin. Çavên te ne çavên xezal û askan in. Di çavên te de agir hildibe û kortalên kûr û tarî tê hene.
Zêndana dilê min çavên te ên reş in. Hêlîna heyîna min di siha mijangên te de ye.

Koçera min, ji xewê rabe koçera min. Buhara pêşin e; mêrg û solîn bi bihn û reng in, ba serxweş e, kanî sar û bi kêf û guşguş in; hezar strana evînê dixwîne. Libadeyê te zîv e, bedena te servehatî ye. Di zendên te de bazinên zêr û gewherkirî, di baskên te de bazbazingên sor û zîvkirî bêlîteya rewşê distirin.

Bisk û guliyên te ên çinçinkirî bihna misk û enberê belav dikin û ser dilê xortan vedidin. Hewa bi bihna te bihndar, çîçek bi rengê te rengdar dibin.
Wek tawûsê lûleper û nazdar î, meşa te wek meşa

qumrî û kevokan nerm û sivik e.

Ho koçera min! Serê te nêvserk û kumribkirî, tiliyên te gustîlkirî, gustîlkên te sefkirî,eniya te toqkirî, nermikên te guharkirî, gerdena te morîkirî, zendên te bazinkirî, lingên te xilxalkirî, bedena te bişkojkirî, şara serê te gulîvk û serçaxkirî, keziyên te şerabkirî, ristika te serdilkirî ne, ho koçera min! Çavên xwe veke ez dixwazim stêra qedera xwe bibînim.

Lêvên te sor in û wek agirî germ in. Gul bi kenîna te dibişkive û bi girîna te diwerihe.
Koçera min, rabe û min bi maça xwe maç bike.
Dilê min serxweşiya maça te û mestiya bihna te dixwaze.
Berde bila zenda min bibe kemberbestiya nevtenga te. Dev û lêvên te kaniya ramûsanê ye, bihêle bila bêriya dilê min, bi ava wê kaniyê dîn û bêhiş bikeve!!! Ho koçera min.

*Hawar h.26*
*18 Tebax 1935*

## BI YEK BIN

*Şêx, axa, beg, gundî, pale hemî brayên*
*hev in û welat bi xebat û*
*xêreta wan hemiyan aza dibe*

Gundî û mela û şêx û axa
Seyda û feqî, nezan û zana
Em kurd in; erê; û yekdil in em
Şabûnî û matemê de hemdem
    Axa û mela û pale, koçer
    Kurd in hemî bira ne yekser
Xelkê me hemî; ji qehr û derda
Gava digirî welatê Kurda
Rabûn û gişa ji dil û tev da
Gundî weke pale şêx û axa
    Pev ra xwe ji bo me dane kuştin
    ..........................................
Gundî û feqî û şêx û pale
Pev re dikirin fixan û nale
Erd û şerefa me pak e; kurd in
Xwîn û neseba me çak e; kurd in
    Axa û mela û pale, koçer
    Kurd in û hemî bra ne yekser
Mêranî û xeyret û şehamet
Kevnar e, li cem me rêz û adet
Erdê me delal e; xemrevîne e
Tirba Mem e ew, welatê Zîn e
    Axa û mela û pale, koçer
    Kurd in û hemî bira ne yekser
Xeyda hev û du ji dil derînin
Kurd in hemî em kezebbirînin
Tirsa we me be ji pûk û badev
Ilm û hinera xwe gî bidin hev

Axa û mela û pal e koçer
Kurd in û hemî bira ne yekser
Xelkê me hemî; ji qehr û derda
Gava digirî welatê Kurda
Rabûn û gişa ji dil û tevda
Gundî weke pale, şêx û axa
Pev re xwe ji bo me dane kuştin
..........................................

*Hawar, hejmar 28*
*15 Gulan 1941*

ISBN: 975-7112-29-1
9 789757 112297
avesta